Diserî de silav û rêzê min ji bo hemû hezkiriyê min û xwendevanê Bûyerpress re. Ez wek hatime naskirin bi Navê Zubêr Salih ev bê guman navê minî rast e ,ji Rojavayê Kurdistanê me li Gundê Delîkê girêdayî Bajarê Dirbêsîyê ji Dayik bûme û li Bajarê Dirbêsiyê û Serêkanîyê jî bi maltî mame ,lê di dawî de ez dor 20 sala li Bajarê Hisiça mam û ji wir ji ber astengiya recîma behss bê çare mam û min berê xwe da Europa û ana 17 sal in li Elmanya bi cîh dibim. ji Malbatek Hunermend im Bavê min dengbêj bû Birayê min Mûzîkjen bûn, min çavê xwe li jiyanê vekir li ser Mûzîkê .

– We kengî û çima berê xwe da stran û mûzîk û dengbêjiyê?
Wek min di destpêkê de anî ziman ez hatim dunyayê di malbatek hunerî de min çavê xwe vekir Tembûr bi dîwarê male ve daliqandî bû bavê min li Tembûrê dixist û stranê dengbêjiyê digotin, destanê kurdî, birayê min mûzîkjen bûn û diya min bi xwe jî dest xweşek sazê bû, lê tenê ji bo xwe mûzîk digot .

– Gelo bandora çi li we bû, hetanî we ev stayîlê melûl û xemgîn bijart?
ji sala 1980 heta 1988 stranê min tev yê kêf û eşqê bûn, lê di dawiya 88an de birakî min 20 salî, ji min biçûktir bû, û di grupa min de bû, bi min re karê mûzîkê dikir, mixatîn Dunyayê, ji ber we yekê rengê stranê min û dengê min ji ser heta bin hat guhertin û sedema sisyan bindestiya welatê min, ev her sê sedem hiştin stranê xemgîn bibin para gewriya min .

– Çaxa ku hûn derbasî gastîna hunerê bûn, çi astengî li pêşiya we derketin?
Bê guman di dema min de astengî pir bûn ;di nava civakê de tişkî şerm bû ku te stran û mûzîk bigota bi çavekî xerab li me dinerîn wek aşiq û qereçî û carcaran nedihiştin zarokê wan bi me re bidin û bistînin û heger min ji keçekê hez kiriba min nikarî bû pê re bizewcim û ji ber wê yekê min keça Xalê xwe anî, û ji ber zewaca merivantîyê 4 Zarokê min kêm hatin dunyayê.

– We bi çi destpê kir, we albom tomar kirin, yan we berê xwe da şahiyan?
Heta me Amûrek Mûzîkê peyde dikir pir zor bû, û teknîk wek ana tunebû, carna min sê roj û sê şevan bi tenê bi Tembûrê dawet digerand bê cihaz û teknîkê deng! tenê bi deng û tembûra xwe .
ji xwe ji bo tomarkirina kasetekê pir zor bû gelek kasêtê xwe min bi misecelakê Normal temar kirine, Studiyo tunebûn wek ana.

– Hinekî li ser stran "Sebahulxeyîrî Xana Min" baxive, we çawe ew helbest bijart, û gelo berî hûn bikin stranew helbest bûye stran, û vê stranê çi da Zubêr Salih?
Min ew helbest di sala 1988an de awaz da û got, bê guman ji helbestê Melayê Cizîrî ye,di sala 88an de Dîwanak Cizîrî ket destê min û bi rastî bala min kişand û her min xwend ez pê ve hatim girêdan, wê çaxê vê helbestê xwe avêt hestê min û min Awaz da û got, hinek ji milet jê fam nekirin û gelekan jê hez kirin, bi taybet Feqe û Mela û kesê rewşenbîr pir jê hez kirin, ez karim bêjim ev bû nasnameya Zubêr Salih ji ber li her çar perçê Kurdistanê hat belavkirin û hat hezkirin, aniha jî min berhemek bi gîştî ji helbestê Cizîrî Afrandîye ji 8 helbestê bijartî.

– Piraniya hunermendên navdar ji şahiyan destpê kirine, gelo ewan şahiyan bandor li hunera serkeftî nedikir?
Belê ez jî yek ji wan kesên ku ji şahîyan derbasî deryaya hunerê bûm, min navê xwe di nav çand û hunera kurdî de bi cîh kir ,lê ne her hunermend dikarîbû ji daweta bibin navdar, tenê çend kes bûn, û pir jî man tenê di çarçova dawetan de, û pêş neketin ! ê min dawet ji bo min aborî bû, lê min dema xwe ya pir dida hunera rast û tim di nûjen de difikirîm, û ji salên 1979 min dest bi karê afrandina stranê kir û yekem berhemê min di sala 1979 ji helbesta seydayê Tîrêj li ser koçkirina nemir mele Mustefa Berzanî bû, û ji wê salê de her salê min berhemeke nûpêşkêşî hezkiriyên xwe dikir, û ez di hatim nas kirin, bi stranê evîndarî ji ber stranê min hestê evîndara dilivand û bê destûr derbasî dilê wan dibû, evîndaran stranê min dikirin diyarî ji bo hev, û heta roja îro, ji ber ez hîn didim û ne rawestiyam e wek kaniyê diherikim.

– Çi di bala Zubêr Salih de hebû ku ew li huner û mûzîka kurdî zêde bike?
Gelek tişt hîn hene kû dixwazim bikim lê derfet çê nebûye yek ji wan min pir hez dikir ez Filmekî çêbikim û rola sereke tê de bilîzim, lêmixabin heta ana ew derfet çênebûye, pir ji lîstikvanyê hez dikim, min dixwest flimekî li ser jiyana xwe çêbikim, ji ber jiyana min pir bi qerbalix derbas bû, û filmek têra min nake, ew maye hisret di dilê min de, lê ana ez hewl didim ku êdî destpê bikim

– We kengî biriyar stand ku hûn berê xwe bidin welatê biyaniyê, û çima ew biriyar?
Biryara derketina min ji welat ji ber astengiyê rêcîma Esed bû, di dema dawî de pir astengî ji min re derxistin, edî bê çare mam yan ez ê dev ji mûzîkê berdim û yan ez ê bêm girtin û yan ez ê derkevim ji welat! ev bû sedema ku min welatê xwe berda û ev dor 17 sal in li xerîbiyê jiyan dikim.

– We çi bi xwe re bir û we çi li Heseka xwe hişt?
Min laşê xwe bir Ewrupa, lê rihê min li Hesekê ma.

– Wek hunermend çaxa hûn koçber bûn we çi astengî li welatê biyaniyê dêtin?
Di koçberiya xwe de me pir astengî dîtin yek ji wan dûrbûna me ji malbat, xweşk, bira, dayik, ap, xal, dost û heval, û welat, me gelek tişt wenda kirin, piştî 10 salan min dayika xwe nedît, Dayika min çû ser dilovaniya Xwedê jî me hev nedît, jiber ez qedexe bûm li Sûriyê, min çend cara hewl da dayika xwe derbasî Bakurê Kurdistanê bikim, ew jî nebû ji ber bê nasname bû.

– Bûye çend sal ku hûn li biyaniyê dijîn, û we çi kar û têkilî li xerîbiyê kirine?
Xerîbiyê hinek tişt dan min, yek ji wan nasname bû, ku ez niha bi serbestî li dunya ye digerim û kar û barê xweyî hunerî pêş ve dibim . li Europa min gelek karê başkirin ji bo gelê xweji serhildana 12 Avdarê û heta roja îro ez her karê xweyî netewî dikim û min pir şevê alîkariyê ji bo malbatê şehîdan çêkirine, û ez hîn berdewam im.

– Ji xwendevanan re hindekî li ser rewşa hunermendê biyaniyê û têkiliyên we bi wan re baxive?
Bi rastî têkela me bi hunera biyaniyê re pir kêm e, û ev şaştî ye, lê wek konser ez beşdarî pir konsertê Europî bûme, û min hunera kurdî bi wan daye nasîn.

– Gelo siyasetê çiqasî bandor li huner û hunermendên Kurd kiriye?
Siyasetê pir bandorek xerab li ser huner û hunermendê kurd kiriye, heger tu ne endamê partiykê be tu çendî hunermend be, tu li ba wan ne hunermend e, gerek tu hevalê wan be yan tu tune ye ji bo wan, û ez bi xwe ne girêdayê tu kesî me serbixwe me, azad im, lê bi êşa gelê xwe re me û qet min xwe ji ber erkê xwe bi şûn de nedaye. siyasetê em di nav xwe de perçiqandin, bandorek pir xerab li ser me kir û hîn dike.

– We serdana Rojava di van 5 salên bûrî de kirbû, û we çi dît, û çi hest bi we re bûrî?
Belê rast e, berî dor sê sala bû min serdana Rojava kir, piştî şerê Serêkaniyê bû ez di Serêkaniyê re derbas bûm bistî 14 sala xerîbî, dema min pêl axa welat kir ez pir bi hest ketim û pir giriyam, pir kêfxweş bûm û pir xemgîn bûm, hesteke nayê şîrovekirin !
ji hêlekê de bêrîkirina min ji bo welat û malbat û heval û bajarokên Rojava û ji hêla din ve xerabkirina welat ku min ew di wê rewşê de dît, pir ji bo min zor bû, nayê ziman, ez 6 rojan li Rojava mam lê mixabin min nikarî bû serdana Hesekê bikim û herim ser gora dayika xwe serê xwe deynim ser gora wê û hinek hêstirê xerîbiyê û bêrîkirinê bibarînim, dilê xwe jê re vekim û bêjim bê xerîbiyê çi bi serê me kir û çi nekir, lê mixabin newşens çênebû, me bi saxî hev wenda kir û piştî koçkirinê jîziyareta goristanê jî bi dest min neket û anha jî hêviyê min şikestîne ji serdana welatê min !!
hêviya min ew bû ku ez Rojekê bi serbestî herim welatê xwe, lê ez ji Rojnema we venaşêrim ez ê nikaribim, ji xedrê hesaba dikim, tev go rojekê ne bûme terfdarê tu rêxistina û ne min şerê kesî kiriye û ne dijî kesî sekinîme lê ji ber ez serbixwe me ez ê nikaribim werim welatê xwe ez ji birayê xwe yê herî nêzîk hesaba dikim .

– We ji bo şoreşa Sûriyê, û ya Rojava çi stran û kar kiriye?
ji bo şoreşa Surî ez wek hunermend min pir tişt kirin lê ezê tenê di warê hunerê de biaxivim :
– Min Stranek li ser koçberiya ji Rojava derxist .
– Min Stranek li ser Alanê Kobani got.
– Min stranek ji Helbestê nemir Arşevê Oskan awaz da û min 8 hunermend tê de beşdar kirin û min kir Clip lê kanalên kurdî neweşandin ji ber me hemû Hêz û Alên kurdî tê de derbas kirin, mebesta min ew bû ku em bibin bira ji bo yekîtiya Partî û rêxistinên me, lê mixabin kesî li me guhdar nekir.
– Min stranek li ser Kobani got ew jî kesî neweşand .
– Min stran li ser şêxê Şehîdan Şêx Maşûqê Xeznewî got.
– Ez beşdarî gelek Ahengên hunerî bûm ji bo alîkaiya Rojava..

– Zubêr Salih li ser ragihandina rêvebiriya xweser qedexe ye, sedem çi ne?
Ez bi xwe jî sedemê Qedexekirina min li ser ragihandina Revebiriya Xweser nizanim, û min gelek caran ji hevalên li Europa jî pirsî ku sedemê nas bikim, kesî tu bersiva rast nedan min û her dibêjin tiştekî me li himberî te tune, lê çima ez qedexe me ez nizanim û ez ji xwe bawer im ku min tişkî ne di rê de li himber kesî nekiriye û min bêtirî 10 salan bi Akadimiya kurdî re kar kiriye û ez dor 2 salan serokê saziya çand û hunerê bûm, lê belkî piştî naskirin ez ne girêdayî tu kesî me û serbixwe me û hunermendekî azad im êdî hew min qebûl kirin, ev texmîna min e, lê belkî tiştin din jî hebûn haya min jê tune, ez bi xwe ji xwe pişt rast im.

.....

– Bûyerên xemgîn yên ku li Rojavayê Kurdistanê diqewimin pir in, hûn çawe wek hunermend wan êş û xemgîniyan dişopînin?
Bêguman tiştê li welat diqewimin bandor a xweli ser rihê medike wek her kurdekî, û hinekî bêhtir, rast e cesedê me li Europa ye lê rihê me li welat e . kurdekî me li ku diêşe em pê re diêşin, ez carcaran ji xwe re dibêjim vê bihara Erebî bihara emrê me bir.

– Zubêr Salih hunermendê yekemîn e, ku ew li ser toreya civakî çalak û aktîv e, nexasim di şevbuhêrkên te yên zindî de, we çawa ev karê xwe dît, gelo hunermend bi vê têkiliyê bêtir nêzî cemawerên xwe dibe, ne wek ku bi salan dûrî wan be?
Gelê me di rewşek awarte de derbas dibe, ev salê şer û komkujî û penaberî pir tiştê zahmet hat serê gelê me, lewra ez tim hewl didim ku bi çi awayî be hinek kêfxweşî têxim dilê gelê xwe de, ez carnan bernamê zindî çê dikim da ku ez zindî bi miletê xwe re bim û hinekî wan bidim jibîrkirin bi axaftinê xwe û mûzîka xwe çendî xizmetek biçûk be jî dîsan ez wijdanê xwe rehet dikim mebesta min jê ev e.

– Hinekî li ser karê xwe wek derhiner baxive, û çi film yan kilîb derxistine, û ji kê re?
Ez bi xwe ne derhêner im lê pêwistiya min hişt ez gelek karê din bikim ,min pir "Video Clip" çêkirin ji hevalê xweî hunermend re bê muqabil, dor 25 kilêpan min afrandin, wek Montaj û Derhêner.

– Em dixwazin hûn li ser berhemên xwe yên tomarkirî bax-ivin?
Berhemê min gihan 23an, tiştê bû mereq ji bo min xwesteka min ew bû di filimekî de bilîzim û xwezî her şehîdek min karîba stranek li ser gotiba.

– Çi maye ku Zubêr Salih li ser stran çênekirine, û jê re bûye mereqek?
Fermana şingalê ya dawî min li ser negot ji ber rewşek ne zelal hebû û bûyer ji strana mestir bû .çi bûyer tê serê gelê me ez tim li ser dibêjim lê ev ferman min nikarî bû tiştekî bêjim.

– Hûnê kengî serdana Rojavayê Kurdistnê bikin û gelo di bala we de heye ku hûn konsêrtan li vir lidarbixin?
Ez hez dikim rojek berî rojek ez serdana welatê xwe Rojava bikim û li her gund û Bajarekî konserta bidim û ji nêzîk gelê xwe himêz bikim, ji wan re stranê xwe bêjim, pir li bendî wê rojê me, tirsa min bimrim li xerîbiyê û wê rojê nebînim!?.

– Şîreta we ji hunermendên nifşê nû re?
Şîreta min ji bo nifşê nû : Bi tiştekî sivik razî nebin ji ber qerbalixek mezin heye di warê hunerê de ,divê tu tiştekî pir balkêş biafrînî, heta tu xwe bide qebûlkirin, bi zanebûn bixebite tenê karim vê bêjim.

– Gotin, xewen û xwesteka xwe di riya Rojnameya Bûyerpress re bêje?
Ez pir spasya we dikim ku we ev derfet da min ku fikir û ramanê xwe bighînim cemawer û xwendevanên Bûyerpress û j yezdanê dilovan hêvîdar im, ku taqetê bide min û hîn û hîn bidim gelê xwe .

Siyasetê pir bandorek" xerab li ser huner û hunermendê kurd kiriye, heger tu ne endamê partiykê be tu çendî hunermend be, tu li ba wan ne hunermend e, gerek tu hevalê wan be yan tu tune ye ji bo wan, û ez bi xwe ne girêdayê tu kesî me serbixwe me, Azad im, lê bi êşa gelê Xwe re me

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Dem Li Benda Me Namîne

Nûşîn Bêcirmanî

Partiya yekemîn a kurd li Sûriyê di 1957ê yî de hate damezrandin, partiyên ku parçe bûn ji destpêka parçebûnê û ta îro roj; kêm , zêde, biçûk, mezin, çalak an jî xiloxavî.....Tev li ber ezmoneyeke dîrokî ne, ji ber gelek egeran ve:

– Endamên partiyan ne ew endamê salên 60î û 70ê yî ne; ne ji aliyê xwendin û zanînê ve û ne ji hêla pêşketina tevaya aliyên jiyanê ve, eger serkirdeyên partiyên kurdî di vê xeyalê de bin, gerek , em (FATIHÊ) li ser tevgera kurdî bixwînin .

– Guhertin, nîşana herî sereke ye di vê demê de, eger em weke berê bimênin, an jî mejiyê serkirdeyên kurd, weke Cebsînê lê were û guhertinan nepijirînin, jixwe em ê li paş demê bimînin.

– Derfetên siyasî û leşkerî yên li ber miletê me ne, bê guman dê neberdewam bin ta dawî, wê lomê gerek em ji dest xwe neberdin û berjewendiyên taybet û partiyane, di ser yê giştiyane re negirin.

Di gel van egeran, mixabin, partî û çarçewên me li hev nakin, li dij wilo bê sînor şerê hev dikin ... Mixabin siyasetmedariya me bûye bendîtiya berê, (Mehmûdkî û Itmankî) bi xwe ye; her partiyek an çarçewek yê din weke neyar dibîne, gelek ji wan , bi şev û roj kar dikin da yê din tawanbar bikin û ha..ha li ser ragihandinê belav bikin, da ew bi tenê(weke xewna dibîne) ji kurdayetiyê re bibe nîşan û simbol..... Di encamê de dijminên doza kurd bi tenê sûdê jê werdigrin...!

Ta kengî, ev nakokî û piroblem wê di navbera partî û çarçewên kurdî de hebin? bihtir ENKSê û TEVDEM .... Ta çi qonaxê gelê kurd wê bendewarê lihevkirina wan be.....ENKSê, di gel rêz û hurmetê, dijminatiya TEVDEMê û Rêvebiriya xweser, ji xwe re erk û karê herî li pêş dibînin, û hewl didin ku ev Rêvebirî û destkeftiyên ku bidest xistine, kêm zêde , wan têk bibin; tenê ji bo tekez bikin ku ev rêvebirî ne li gor qonaxê ye.....Qelenê vî karî jî çi be bila bibe...!

Tevdem jî, dîse digel rêz û hurmetê, rêvebiriyeke tek alî birêve dibe, digel dehê şaşiyan, a din têbînên partiyên ne dirêvebiriyê de jî nabînin, wilo jî tim ENKSê ne weke hevbeşê kar dibînin û ji hêz û partiyan dixwazin beşdar bin, ne hevbeş bin di rêvebiriyê de, jibîr dikin ku rikberiya di çi welatî de, çendî xurt û li pêş be, wilo jî rengê şaristanî ji desthilata wî welatî re dide nişankirin, ya dî her û her serkeftinên gewre bi karê hevbeş tên, ne bi dûrketina ji hev û devavêtinan ...!!

Ne tenê ENKSê û Tevdem li Rojava hene, lê belê Partî û çarçewin din jî hene, ne li hêla TEVDEM ê ne û ne li hêla ENKSê ne jî, eger em kurdewariyê bikin, pêdiviye hemû hêz ligor hene, beşdariyê bikin di diyalok û guftugoyên ku bibin di rojên bê de – ne weke hin siyasetmedar, mixabin dibêjin– divê ev partî û çarçewên din, bi ENKSê yan bi TEVDEMê re bin–.....

Em minaken kurdi binin ber çavên xwe.... gelo li Kurdistana başûr çend salan vê nakokiyê di navbera herdu partiyên sereke de PDK û YNK, berdewam kir? bi hezaran kuştî di şerê birakujiyê de ketin, bi sedan gund û bajar wêran bûn, bi hezarê hezaran rêbendên saykolocî di navbera wan de berz û bilind bûn... Û li dawiyê lihev kirin...! li ser destê Madlîn Olbirayt, dema destê kak Mesûd Berzanî û Mam Celal Talbanî kirin hev û di encamê de peyman girêdan ku şerê birakujî xêza sor e.....Ewsqas destkeftiyên Kurdistana Başûr, bê goman ji encamên wê peymanê ne.

Bi diyalokeke demokratî, pirsgirêkên me çareser dibin, giring e em zanibin, tevaya rastiyê ne li nik aliyekî bi tenê ye, û ne aliyê din bi tevaya xwe şaş e, na.....Hin li vir û hin li wir heye, ev rastiyeke, tu kes nikare çavên xwe jê bigre.

Dem li benda me namîne, derfetên weha jî her roj û meh nayên....Kurdayetî bila ew bê ya lê pêş, partî û çarçew diçin û tên, lê gelê kurd wê her û her hebe.

Rojhilat Wê Wilo Nemîne

Silêman Azer

Ev bû çend sal Rojhilat di rewşeke awarte re derbas dibe, û ev bûyer bêguman ne wilo bi hesanî wê di ser dewletên wê re derbas bibin, lê sed ji sedî wê guhertinin mezin jî bi xwe re bîne.

Sedemên vê rewşa awarte pir in, siyasî,civakî û aborî ne, û tekez roleke navdewletî jî tê de heye. ji piştî şerê cîhanî yê diwemîn ve Rojhilat di rewşeke wilo re derbas nebûye tevî ku gelek bûyer li gelek cihên dî çêdibûn û bûne sedemên guhertiin mezin li wan welatan. ev bûyer wê jîwariyek nû li herêmê peyda bike û wek her guhertinan wê hinin biser bikevin û berjewendiyin baş qezenc bikin û hinin dî wê gelek tişt ji nav destê wan derkeve.

Li gorî rewşa kurdî ya îro wê kurd karibin çi sûdeyê ji wan guhertinan wergirin di pêşerojê de, û gelo kurd dipîvanên hêzên navdewletî de hene an wek hemî bûyerên berê wê bêpar bimînin ji wan guhertinan.

Ez dixwazim bêtir li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê rawestim,li gorî wan pîvanan. piştî krîza Sûriyê destpê kir û xwepêşandan seranserî wê rabûn, çav bêtir li ser aliyê kurdî bû û belkî ew bû ya ku dikarîbû her tiştî li Sûriyê biguhere, wilo hêvî hebûn ta gelek ji aliyên rikberiya Sûriyê bi xwe jî wilo li partiyên kurd dinerîn, ji ber kurd ji hemî aliyîn dî yên Sûriyê xwedî bizavek dirêj bûn di kar û xebata siyasî de û partiyên kurdî ji kevintirîn partiyên siyasî bûn li Sûriyê. lê piştî rewşa sûriyê dirêj kir hate diyarkirin ku ev pêşbînî ne di cih de bû û wan nedikarîbû di vê dema hestiyar de rola xwe bilîzin, ji ber nikarîbûn xweşik rewşa navdewletî bixwînin an riyek û nerînek wan hebe di vê krîzê de, rast e rewşa Sûriyê ji her alî ve taybet bû û wek kurd dibêjin bû girêka kora, û bi tenê partiyên kurdî li bendî demê man, û bi nakokiyên xwe yên navxweyî mijûl bûn.

Kurd bûne du parçe di vê bûyerê de û hewlwesta herdû aliyan gelekî ji hev dûr bû ta em dikarin bibêjin ku di gelek nerînan de bûne dijminê hev jî, aliyekî xwe sparte rikberiya Sûriyê û mixabin bêyî ku hêza wê hebe û karibe daxwaz û mercen xwe bi rikberiya Sûriyê bide pejirandin, û alîyekî destê rikberiya ku helwesta wê nêzîkî ya rêjîmê ye girt, û wê dikarîbû dest deyne ser gelek tiştan û hêzeke xwe yî leşkerî çêbike û xwe wek desthilatdar nîşan bike, bêguman ev ne wilo ji xwe ve hat, lê gelek aliyan alîkariya wê kir û dixwestin wê diyar bikin ku ewe yê ku dikare bibe berpirs di ber kurdan de li her hevdîtin û giftûgoyan, lê ev yek neçû serî û aliyê dîtir jî tevî bêhêzbûna xwe ma aliyek ku binavê kurdan danûstandinan dike, ango ew parçebûn kûrtir bû.

Bi demê re zelal bû ku aliyek ji wan bi tena xwe nikarîbû nûnertiya kuradn bike û berjewendiyên kurdî bi hevpeymaniyên xwe bide pejirandin, hîna rêjim wek bere dibeje ku kurd parçakjı pêkhatî û rikberiya Sûriyê ne, nikare helwestek zelal diyar bike li ser pirsgirêka kurd ji bilî tarîbûna nerîna dewletên ku roleke mezin di kirîza sûriyê de dilîzin, ji ber her aliyek ji wan têkiliyên wî bi bihtir ji dewletekê re hene ku berjewendiyên wan dijî hev in û belkî bi tenê li ser rewşa kurdî nerînên wan yek in ku tev de naxwazin dewleteke kurd li herêmê peyda bibe, lê dîse leystikên navdewletî diyar nebûne ka pilana wan çi ye û wê çawa ta dawiyê danûstandinê bi vê rewşa awarte re bikin di pêşerojê de. lê kurd bi vê parçebûnê îro ewin aliyê herî lawaz û bêhêz.

Wek min di destpêkê de got, wê ev bûyer ne wilo wek tavekê zû bifirike lê tekez wê şapekê bi xwe re bîne di barandina xwe de û hêdî hêdî encamên wê diyar dibin. Gelo kurd bi vî şêweyî wê karibin berjewendiyên kurd misoger bikin û mafê kurd bidest bixin?

bêtir ew aliyên siyasî dikarin bersiva van pirsan bidin..!

Ol.. Tirs û Daxwaz

Ol, encama tirsa hebûnê ye. Lewra her hebûn xwedî encamekê ye û ew encam, bingeha hemû tirsên mirovan e.

Tirs, pirê caran weke têgîneke neyînî û daxwaz weke têgîneke erênî tê têgihîştin. Herdu jî afirîner û motorên herî mezin ên enerjî û dînamîzma mirovan e. Mirov herî zêde ji ber van herdu hestên xwe yên bingehîn dînamîk û wêrek in. Her du jî hestên pir xurt in ku serdestiyê li jîyana mirovan dikin û xet, reng û teşeya jîyana mirovan dîyar dikin, dihûnin.

Pirê caran ev herdu aliyên mirov bi hev re di nav aştiyê de xuya bikin jî, ev di rastiya xwe de ne aştî, lê encama serdestiya tirsê ya li ser daxwazê ye. Caran tirs daxwazê diafirîne jî û caran daxwaz, tirsê weke çek bikar tine. Lê di rastiyê xwe de ew jî, her tim bi hev re di nav şerê desthilatdariyê de ne ku ji xwe yekem şerê desthilatdariyê di nav mirovan de, ji wan dest pê dike û mora xwe li jiyanê dixe. Ew şer çendî giran be, encam serkeftina kîjan alî be jî, bandora xwe ya li ser der û dora mirovan jî ewçendî xurt û mezin e.

Li gel rastiya şerê di navbera tirs û daxwazê de jî, tirs û daxwaz di heman demê de hevkarên hev ên herî mezin û baş in. Lewra tirs bingeha xwe ji wendakirinê û daxwaz jî bingeha xwe ji bidestxistinê digire. Wendakirin û bidestxistin her çendî du tiştên dijberî hev xuya bikin jî, ew di heman demê de destbirakên hev û axretê ne jî û bêyî hev nikarin bibin. Şer û hevkariya navbera tirs û daxwazê jî li ser bingeha vê nakokiyê şîn dibe.

Tirs jî û daxwaz jî du çekên herî mezin ên mirovan in. Mîna hemû çekan ew jî dikarin xwe jî û der û dora xwe jî bikujin, ango tune bikin. Mîna hemû çekan, ew jî bi temamî girêdayê armancê ne. Armanc berê çekan bide ku derê, çek di xizmeta wê derê de ne û her kêliyê jî, li gor guherîna armancê, amade ne ji bo bikevine xizmeta tiştekî din. Loma jî mîna hemû çekan ev çek jî bi metirsiyan dagirtî ne û ji bûyîna me û heya mirina me jî bi me re ne. Ne çekên bi destên mirovan hatine çêkirin in. Loma jî ne pêkan e mirov xwe ji wan rizgar bikin. Lê mirov dikarin wan xweşik

Mahabad Felat

bikar bînin û nehêlin ji aliyê kesên din ve bêne bikaranîn ku ji bo vê jî beriya her tiştî zanebûn û piştre jî birêxistinî divê.

Mirov, bi hebûna xwe ya fîzîkî, hebûna herî reben, lawaz û bêparastin e. Lê ji ber mêjiyê xwe, xwedî çeka herî mezin û bi bandor e jî. Ol, encama tirsa hebûnê ye. Lewra her hebûn xwedî encamekê ye û ew encam, bingeha hemû tirsên mirovan e. Tirsa encama hebûnê, bixwe re ne tenê olan, lê gelek lêgerîn, raman û kiryarên cuda jî afirandiye. Lomaye ku her lêgerîn, raman û kiryar ji bo bikaribe xwe bigire û tune nebe, pêdivî bi hêzgirtinê û pê re jî xwebirêxistirinkirinê dîtiye.

Ol, bi tenê dikare bi bidestxistin û piştre bikaranîna tirsa mirovan xwe li ser lingan bihêle û bi pêş bixe. Yek ji taybetiya herî mezin û bi bandor a olan jî ew e ku pir bi hostetî dikarin tirsên mirovan piştî demekê veguhezînin û bikin wekî daxwazên mirovan. Piştî demekê, mirov êdî teqez ji xwe û baweriya xwe piştrast e, lewra sînyalên tirsê ewçendî zêde û bi hostetî çûne binhişê mirovan ku giyan, kesayet û daxwaz, li gor wê tirsê teşe girtine. Tirs êdî bûye bawerî, daxwaz û yekane hêvî ji bo mirovan. Lê tirs, weke tirs, tu carî ji binhişê mirovan dernakeve û ew e ku vê hêvî, daxwaz û baweriyê xurt jî dike(!) Li gel vê jî, ol caran pêdivî pê dibîne ku bi "tirsa Xuda", "tirsa agir", li vê jîyanê tirsa belavbûna bêexlaqiyê û pê re malbatiyê û gelek tiştên din. Li ber vê û pê re jî, nîmetên bihiştê û bi olê re paqijî û birêkûpêkî û biexlaqiya li vê jîyanê jî bi taybet tê kirin. Îcar birêkûpêkî, paqijî û biexlaqî çendî bi olan ve girêdayî ye?

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî .. Mehfûzê Mele Silêman

Pêşmerge Me. . . . . .

Bi hêz im bi rêz im
Bi halan û hêrz im
Welat di parêz im
Pêşmerge me. . . . . .

Bi cerg im diwêrim
Wekû baz û şêr im
Ez dijmin di hêrim
Pêşmerge me. . . . . .

Mehfûzê Mele Silêman, navê wî yê kurt e, tenha bi vî navî berhemên xwe yên kurdî dinivîse û belav dike, û bi navê M.Reşîd nivîsandinên xwe yên bi Erebî nîşan dike, ango, navê wî yê dirust û fermî "Mihemed Mehfûz Mele Silêman Reşîd" e.

pêgavan davêjim
Xwîna xwe dirêjim
Sirûdan dibêjim
Pêşmerge me. . . . . .

Li banî dinêrim
Tîrêj û sitêr im
Erkan na jimêrim
Pêşmerge me. . . . . .

Çekdar im haydar im
Kujarê neyar im
Li şer arê har im
Pêşmerge me. . . . . .

Mirinê nasnakim
Çimkî rewanpak im
Ez goriyê xak im
Pêşmerge me. . . . . .

Her dem ez şiyar im
Leheng û dijwar im
Li şer tûj û har im
Pêşmerge me. . . . . .

Ez azadîxwaz im
Serbest û şanaz im
Bi ol û rêbaz im
Pêşmerge me. . . . . .

Bi çek im bi rext im
Xwedan tor û bext im
Bi al û paytext im
Pêşmerge me. . . . . .

Nabezim narevim

Di 25ê meha 9an sala 1962'an de li gundê Riçabiya başûrê Qamişlo ji dayik bûye, xwendina xwe ya seretayî, amadeyî û dûwayî di dibistanên bajarê Qamişlo de bi dawî hênaye, û di sala 1986an ji zanistgeha Endazyariyê Beşê Wizê li xwendegeha Helebê derçû we.

Ji rê dernakevim
Divê bi ser kevim
Pêşmerge me. . . . . .

ji dijmin natirsim
Ez bi tûnd û qurs im
Li welat dipirsim
Pêşmerge me. . . . . .

Lawê kurdistan im
Ez bê rawestan im
Bi xwe dibistan im
Pêşmerge me. . . . . .

Kurd im têkoşer im
Her dem şoreşger im
Bergir û rêber im
Pêşmerge me. . . . . .

Navê min pîroz e
Li nik êl û hoz e
Cejna min newroz e
Pêşmerge me. . . . . .

Qamişlo – 27. 07. 2014

Meyger

Masa me li ber me ye
kasa me bidest me ye
Em dê meyê bi noşin
Şahî û cejna me ye

Meyger kasê dagire
Bibûr li me negire
Em va mest û serxoş in
Sema li bendî me ye

Hildin kasa hevala
Ya kulîlk û şemala
Em bi can û bi hoşin
Cîhan ne hember me ye

Meyger me'dê xwe meke
Me dê û bav her yeke
Em buhiştê difiroşin
Par ji dojê me he ye

Li Enteriyê, di ahenga newrozê de, sala 1971'an yekem car helbestên kurdî ji cemawerê kurd re xwendiye.

Meyger bêne tembûrê
Da saz bikim rê dûrê
Em bi bext û qidoşin
Kêfxweşî mafê me ye

Em bi meyê nabin gêj
Ne dilmij û ne xwînrêj
Em dilşad û serxoş in
Balaçûn rêça me ye

Meyger şûşa min veke
Xweşik û sayî seke
Em dê reha bi doşin
Ger bişkê jê tune ye

Qamişlo 20 –11–1990

Yara dilber

Xwîs û keser
şor û xeber
di qirikê de (sekinî)

Kul û keder
wekû bîber
di canê min de dijenî

Roja lider
sipî û zer
tu car bimin re ne kenî

Yara dilber
deng li herder
nav ji bîr nabe ji binî

Ezim perwer

bilav û şer
dijî pîs û zinx û genî

Lêvên şekir
memik û ber
tîm e, wey li min rebenî !
Evîn bê cir
awir quncir
dilê min kir pêt û tenî

Min dît jider
vekir pencer
mingot: bi soz tu ya minî

Qamişlo – 24/11/1984

Bere Bêne Bîra Te

Gava min dest dida te
Bext û dil hatin ba te
Bo te diçûm civata
Bere bêne bîra te

Li ser te ser xweş bûm
Bi te pir gur û geş bûm
Her çaxî anî beş bûm
Bere bêne bîra te

Navê te ser ziman bû
Rewan bo te arzan bû
Li ba min tu ciwan bû
Min digot: bi te felat e

Xwezka te dêm bi şişte
Te Hindur jî bi malişte
Li ber neynikê rûnişte
Ji nû tu çûba xebata

Roja çû qet venagerê
Tu car nayêm wek berê
Nema dixum wê serê
Yê te xwest wa giha te

Birîna min dijwar e
Min gazî û hawar e
Dermana nekir çar e
Ber bêne bîra te

Te biyan û jar kirim
Ji hogira dûr kirim
Nîq û viran gêr kirim
Mirovim dil nelat e

Ez û baranê yar in

Di sala 1975an de yekemîn gotar di rojnameya "El sewra" de belavkir ye. Û Yekemîn pirtûk di sala 1993an bi navê (4000 pendê kurdî) çap kir.

Em jiyanê dibarin
Em bi agir dikarin
Dana me wek ferat e

Ji felekê na tirsim
Bi zanistî dipirsim
Li dîrokê û dêrsim
Xwezî ew dem bi hate

Hew dikim dil paqijî
Hew dixum nanê rijî
Bi xap û hevalkujî

Yekemîn dîwan di sala 2014'an de, bi navê (Rista Min) li Qamişlo çap kir. Bi dehan helbestên wî yên nebelavkirî û neçapkirî hene, bendewarê derfetê ne.

Ji destê malmîreta

Bide min soz û peyman
Bêje: ez şaş û poşman
Binivîse li her eywan
Hingî ezê bêm ba te
Pelekî nû dê vekim
Çavsoriyê pê çekim
Dîsa xwe gorî tekim
Hingî kar û xebat e

Tertus –17. 3. 1989

Dermanê Te Maliştine

Ey hevalê sala pengî
Tu bi navî, pir bi dengî
Bi kirasê hezar rengî

Tu xweş dostê bihna tengî
Bi hawar û bez û cengî
Ji mitalêre tu lehengî

Bi pêçanê tu çek tengî
li bazara baş bi bengî
Qaşo ! li cejna bi şengî

Bawerke tu ne tu tiştî
Tu neyar û giranpiştî
Tu destgerî, hîz û pûştî

Bi hesanî tu tê kirîn
Tu fişikan dike bi xwîn
Tu jehr dikî her hilm û jîn

Tu her cihî dikî dûman
Tu reş dikî hiş û goman
Tu mêrxasa dikî coran

Bêna devan tu dikî pîs
Dûman ji te dibe werîs
Tu xercdikî tûr dûv telîs

Kesan dikî parsek û qels
Ser te dibe derew û bels
Hêrz û hiner tev dibin mels

Tu zikê têr dikî birçî
Tu ziwayî, tehlî û pûçî
Gemardevî, qelêrpêçî

Tu ardûwê giş dibe dû
Diçilmisin her çav û rû
Xelîtk diçin birîk li dû

Abora gel dibe wêran
Tu nahilî xwê û arvan
Rûmet bi te dibe arzan

Peyde dikî jan û êşan
Semax dibe gunhê pîsan
Kurmik dibe mereqa can

(Qût)ê malan tu dikî talan
Ger tu nebî, şer û lêdan
Ger tu nebî, tune razan

Ey dostê lûl û pîpîka
Nema te dikim birîka
Nema zerdikim tilîka

Nema ez li te digerim
Bi qirûşkî te na kerim
Bi zanistî venagerim

Ey dijmê ol û jîna
Cansaxî li te bi kîne
Soz û bextê te tu nîne

Agir û pêt li dûv tene
Çepel û derd şanê tene
Kesê bi tere ne ji min e

Kurmikê te gelek pîs e
Yek pey yekê, dibê dîse
Bêdawiye Rotîn rîs e

Navê te bi xwe tûtine
Dostaniya te kuştine
Dermanê te maliştine

Tertûs–13/03/1989

Biyan im

Li vê çerxê û vê çaxê
Bû we cihê xem û daxê
Ez biyanbûm li vê taxê
Ez bê par mam ji çeraxê
Çandî bûm li vê mîştaxê
Nîştecî bûm li peraxê
Navdar bûm ez li vê kaxê
Lê mam dîlê ax û waxê

Ez ciyawaz bûm vê carê
Wekû bikevim ji darê
Zîvirîm malê vê xarê
Çimkî ne nasbûn yên tarê
Seyr û mat bûm vê êvarê
Hest û hiş çûne bêmarê
Zar û ziman dibên: jarê
Hêstir ji çavan tên xwarê

Şensê pîse,ku mam li vir
Bextê reşe,qend bû kevir
Rûwên tal û tirş û zivir
Di laş de bûn tîr û bivir
Hevjînî bûwe komek vir
Divê ez bar bikin ji vir
Pêxwas bûne xwedî hevir
Fêkî bûne sîr û tivir

Resen û qenc çikiyan e
Dost û hogir ne xuyan e
Silav li dizan ziyan e
Xwedanê şan û riyan e
Mîrê cengê bi halan e
Akam,azar û wêran e
Şaxê wî li her ciyan e
Dirav,mebest û înan e

Li vegerê mam behitî
Hiş ji serê min şemitî
Dil şewitî..cerg peritî
Dev qul nebû.. ne şehitî
Ji rewşa pîs û(lewitî)!
Por weşiya.. pêst qemitî
Xwezî bi cavê şelbitî
Ne korbûna hitm û petî!

Em û dijmin tevlî hevin
Em û xwedî dûrî hevin
Derdê giran: em ne levin
Em sed dest û hezar dev in
Hevwelatî ji war di revin
Kesê mayî bi gerev in
Rojê wana hemî şev in
Xort ji tirsa dernakevin

Em saxin, lê em mirîne!
Karê me şîn û girîne
Mal jî tirbê vekirîne
Sar û ziwa û tarîne
Rêvebirê me terîne
Bê sazan û bê serîne
Xelkê ew arzan kirîne
Poz û zarê wan birîne

Bê revim derwaz girtîne
Têperên sînor kuştîne
Xelk berçîne yan jî tîne
Sûcdarê mezin partîne
Ji çekdaran em xwestîne
Bi pêdawîstan pestîne
Em bi tirsê hêvaztîne
Bi sa xwedê parastîne

Mehfûzê mele silêman
Qamişlo – 27.06.2016



Gelek gotar û rist di belavok, malper, kovar û rojnameyên kurdî bi navên nehênî wekû (Bêdeng, Bêdeng mela, Deysem Elo,..) de belav kirine. Pir caran di mihrecan û helkeftan de wekû helbestvan beşdar dibe.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Çima Zarok Ji Dibistanê Ditirsin

Zarokên newêrek ji çûna dibistanê ditirsin, ji ber ku helwestin berî niha bi wan re çêbûne, û ew helwest bi çûna dibistanê ve girêdayî ne, wek mînak, zarokên ku ji ajalan, yan ji lêxistinê ditirsin, ew helwest di serê wan de dimîne, herweha zarokên ku ji tariyê, cehneme, mirin, cin, û agir ditirsin, ji xwe ev tiştên bûrî hemû ji hêla malbatê di serê zarokan de têne çandin. Lewra çi tiştê nû û ne diyar di jiyana wan de jê ditirsin.

Wek van zarokan nebawerî bi her tiştî li cem wan çêdibe, sedem jî dê û bav û rexneyên berdewam ji wan re ta ku nekevin şaşiyan, û gelek awayên perwerdeya şaş, ji dîtina mêvanan û derbasbûna ezmûnan ditirsin, û naxwazin biaxivin ta ku rexne li wan nebe û yan nekevin şaşîtiyan de.

Ji bilî tirsa ku bi wan re çêdibe, hin tiştin dî jî derdikevin holê mîna fedîkirin, xemgînî, tirsa berdewam, reşbînî, û ziman giranbûn.

Sedemên Tirsa Zarokan:

Sedemin bi zarokan ve girêdayî ne:

– Kêmasiya di laş de mîna kulekî, hewlbûn, dirêjbûn û kinbûna zêde, qelewbûn û zeîfbûna zêde, herweha kêmbûna asta zîrekiyê, û paşketina di xwendinê de, ev hemû dihêlin ku yê zarok ji xwe ne bawer be û ji derdorê bitirse.

– şopandina hin bernameyên ku çanda tundiyê belav dikin, dibe ku ev yek bibe sedema tirs li gel wî zarokî çêbibe.

– Operasyona xeyalan sedemek ji sedemên tirsa zarokan di helwestên cuda de ye, ku tên pêş zarokan, lewra xeyal tirsê dixluqîne.

Sedemin bi mamosteyan ve girêdayî ne:

–Dibe ku mamoste di rewşeke tendirustî xerab de be, ji ber mamosteyê xwedî kesayetiyek derûnî xerab dibe sedema yekem ji tirsa zarokan re, ji ber bi sedem û bê sedem bi ser wan de radibe, û hindek ji van biserabûn tund in û bi danustendina şagirtan ve ne girêdayî ne.

– Gelek mamoste şîretan li zarokan nakin û riya baş rê wan nadin, tenê waneya xwe didin û derdikevin.

– Bikaranîna awayê lêdanê di pîstirîn helwest de, û bi awayekê hovane û tewş bê yasa.

– Awayê danustendina mamoste ji hevalên xwe re li hinder û derveyî dibistanê, ev danustenduina hişk û tund ku ji mamoste dertê, bandora xwe li zarokan dike, û herweha dibe yek ji sedemên tirsa zarok ji mamosteyan.

Sedemên ku bi malbatê ve girêdayî ne

– Awayê perwerdeya şaş ku zarok di salên pêşî ji qonaxa temenê xwe dibîne. Piştî ku guhdan li zarok dibe, û di aramiyê de dijî, bav ji nişka ve dest bi lêdanê dike her ku zarok şaş dibe, yan tiştekî dişkîne, û ev danustendin li ser zarok nû ye, ji ber ku fêr bûye bav wî delalî bike. Li vir ev zarok şaşomaşo dibe, û ew hastên jixwebaweriyê ku malbatê di sê–çar salên dawî de dabûnê wenda dibin.

– Rexne û pê re xeydandin, zarok dixe hestê kêmasiyê, û asta jixwebaweriyê li gel wî kêm dike.

– Desthilatiya bavan û hezkirina wan ji destdanîna li ser hemû liv û tevgerên zarokan bê ku derfeta azadiya ramanê bidnê, anku divê bi ya wan bike, ev tişt dîsan hestê tirsa dijberiya wan li gel wî diafirîne.

– Jihevketina rewşa malbatê û nakokiyên di navbera dê û bav de, zarokan dixe rewşeke ne aram de, xwebaweriyê li gel wan dikuje, û tirsa ji dê û bav û tundiya wan li gel wî xurt dike.

– Tirsa bavan û ne aramiya wan dibe jêdera tirsa zarokan.

Rolakesên pispor di çareseriya pirsgirêka tirsê li gel zarokan:

divê kesên pispor nas bikin ku tirs ji tevlêdan û dûbarebûnê çêdibe, û famkirina tiştan li gor rastiya wan û avakirina hestek xweş derbarê wê de ji giringtirîn sedemên ku divê ava bibin ta dijî tirsê kar bikin.

Ji ber pisporê civakî bi gelek aliyan re danustendinê di dema çareserkirina pirsgirêkê de dike. Ji wan rola kesê pispor bi yê zarok re, ku kar li ser amadekirina rewşên civakî bo mezinbûna zarokê şagirt di hindirê dibistanê de bi awayekî dirust û saxlem, û xweşkirina têkiliyan di navbera wî û mamoste, heval, û rêvebiriya dibistanê re, herweha alîkariya wî di girtina sûdê ji xizmetên ku saziyên civakî ji dibistanê re pêşkêş dikin.

Ji Erebî: Bûyerpress

Dîrok û Sernavên Gundekî.. Gundê Xirabê Reş

Ji Erebî: Mihemed Zekî Mihemed.

Ji devê kalemêr Mihemedê Ebdo, ku di sala 1925an de li gundê (E'tbê) jidayik bûye, hîn di pêçekê de bû, hatiye gundê (Xirabê Reş) û li wir cîwar bûye, hatiye girtin.

Navê gund: Tê gotin ku ji ber axa vî gundî reş e, navê (Xirabê Reş) lê hatiye kirin.

Hin jî dibêjin ku ji ber ev gund gelek caran wêran bûya û careke din ji nû ve hatiye avakirin, ev nav standiye.

paşê di pirojeya Zinara Erebî ya kirêt û rû reş, di sala 1963an û siyaseta erebîkirinê de, navê wî kirine (Dêr Hafir).

Cîgehê wî yê kargêrî û xaknîgarî: li gorî dabeşkirina hikûmetê ji hêla rêvebiriyê ve bi Qeza Çila Axa ve girêdayî ye, li gorî hikûmeta kantona Cizîrê bi QezaTirbespiyê ve hatiye girêdan, Xirabê Reş 22 km an ji bajrokê Çil Axa û 26an ji bajarokê Tirbespiyê dûr e, sînorên wî yê xaknîgarî jî ev in: Rojhilatê wî gundê Qaşto û Dêrûna Axê ye, rojavayî wî gundê Şêtika ye, başûrê wê gundê Alaqos e, bakurê wî gundê E'tbê û sînorê Turkyê ye, herweha 4km an ji sînorê Turkyê dûr e.

Hozên ku di gund de heyî: Hoza Hemka, ya ku di sala 1880ê de gund damzirandiye, di wê demê de ji (60) malî ava bû, ta niha jî hoza Hemika li wir cîwar e, paşê ji ber nîrên jiyanê yên zor dijwar jimara malbatan bi rengekî mezin kêm bû.

Ol: Şêniyên gund hemî mislman in.

Giringtirîn sernavên arkolojî di gund de: Xaka Gozel û Gola Behdê li başûrî gund in û diyarê Nîşko li bakurê rojhilatî gund e, herweha Merqeda (Şêx I'sma'îl) di goristana gund de ye, lê tu jêderên avê li gund nehatin dîtin ji loma gundiyan ava bîran di malên xwe de bikar tanîn, tenê robarekî berwext di Zivistanê û destpêka buharê de ji (E'tbika) kevin bi alî gund de diherike.

Gitingtirîn xizmetguzariyên ku li gund peyda dibin: Bîreke tirwazî heye, herweha Dibistaneke pîsazkirî jî lê heye û cadeyeke qîrkirî tê gund, lê di van salên dawî de ziyan gihayê de, ji ber herêm bi tevayî kurdî bû, ji encama piştguhkirina rêjîma Sûryê ji herêmê bi tevayî re, xizmetguzarî bi derengî gihane gund.

Xaka çandiniyê: Rûbera xaka gund a çandiniyê dora (9000) donimîye, biencamaçespandina Zinara Erebî ya rûreş û kirêt (7000) donim ji hêla dewletê ve hate desteserkirin û li Erebên Mxmûrî hate belavkirin, yê mayî arziya wê li hoza Hemika vedigere, (piraniya şêniyên ku niha di gund de mane ji yek malbatê ne).

Çandinî: Ji kevn de (Genim – Ceh – Nok – Nîsk – Bîqya) lê dihatin çandin, lê niha (Kemûn û Gijnîj "Kizbera) jî têne çandin.

Giringtirîn lawir: Ji kevn de (Ciwanga – Hesp – Hêştir – Çêlek – Pez – Mirîşk û Balinde) xwedî dikirin, niha tenê (Çêlek – Pez – Mirîşk û Balinde), karê serke ji gundiyan re çandinî û sewalvanî ye.

Giringtirîn Bûyerên dîrokî: Bi piştgîriya xwe ya ji Pêşmergeyên Barzaniyê nemir re, bi dirav û cebilxane û çekan navdar e.

Ji rûpela Çar Çira ya fêsbûkê.

Gundê Tebkê

Gundê Tebkê li hêla koçerann dikeve. Ew hêl hatiye naskirin bi hêla koçerann, çimkî piraniya gundê wê deverê koçerane, û ew gund bi xwe ne ji zû de hatine avakirin, ji ber ku koçeran di dema berê de gund ava nedikirn ew koçer bûn, havînê diçûn zozanan û zivistana dihatin germiyanan, deşta Mêrdîne. Ev beriya ku Serxet û Binxet çêbibin ji ber ku koçer xwediyê sewêl bûn, dema ku çêra sewalê wan li beriyê nedima û diniya gerim dibû, konê xwe datanîn û berê xwe didan zozanê Fereşînê. Sînor tune bûn, Kurdistan hemî di bin destê Osmaniyan de bû, û beriya ku berfa potik li zozana destpê bike koçeran berê xwe didane beriyê, beriya wan jî, ji çiyayê Qereçox destpê dikir ta bi çiyayê Şingalê, ev berî hemî li pêşiya koçeran vekirîbû, lê piştî ku sînor ketin nava Kurdistanê, Serxet û Binxet çêbûn, koçeran jî dev ji koçiriya xwe berda û gund ji xwe re ava kirin.

Carekê min ji Hisênê Mehme Eliya muxtarê gundê Sewêdiyê li ser avakirina gunda pirsî, wî ji min re wisa got: Piştî sala 1927an me wek koçer nûka dest bi avakirina gundan kir ji ber sînor hatin asêkirin û nema me karî em herin zozana.



Derdora gundê Tepkê di buharan de pir xweş dibe, ji ber ku hemî qelaç in, ew qelaç bi gul û kulîlkê rengîn têne xemilandin. Gundê Tebkê dused û hevtî û heşt (278) mal in, û şêniyê wî şeş hezar û dused (6200) mirov in. Mirov dikare bêje ji seda heft yan heşt, ji wan şeş hezar û duseda, xwedî nasname ne û yê dî tev bê nasname ne.

Gundê Tebkê hemî koçer in, muxtarê gund, mala Ebdil Ezîzê Belîn e, ez bawer im yek ji wan zavayê Nayîfê Paşê ye lê nizanim kîjan ji wan e, Ji ber dihate gotin ku carekê Nayîf beroşek pirax daye destê xulamekî xwe jê re gotiye tê bibe gundê Tebkê (ji keça wî re lê yê xulam nizane çi di wê beroşê de ye) di navbera herdû gundan de ne gelek e, lê tev hêr in newal in yê xulam jî beroşê datîne ser serê xweû berê xwe dide gundê Tebkê beriya bighê gund di newalekê ji wan newalên kûr de qey serê wî di bin beroşê de diqerime, him wê bihna xwe berde û him dixwaze nas bike ka çi di vê beroşa li ser serê wî de ye. Dema ku devikê beroşê ji ser radike dibînê va pirax in qey dilê wî diçe wan, libekê dixwe û careke dî devikê wê datîne ser û diçe beroşa xwe dide keça Nayîf û vedigere tê malê ka bê çiqas di wê navê re diçe keça Nayî tê mala bavê xwe Nayîf jê dipirse ma ew piraxê me ji te re şandibûn xweşbûn? Keçik jê re dibêje belê bawê xweşbûn lê wele libek ji wan kêm bû, qey dema ku pîreka pirax çêkirina ew bi rêz çêkirne û yê xulam haj rêza wan nîne ji lewma dema ku wî yek xwariye ciyê wê maye vala. Dema ku keçikê ji bvê xwere got: Libek kêm bû Nayîf bakire wî xulamê ku beroşa piraxa birbû, yê xulam hat li pêşiya Nayîf sekinî Nayîf jê re got: Çima libek ji piraxa kêm bû? Yê xulam bîra mirina xwe dibir lê bîra ku wê rojek were û pirsa wê liba piraxa jê bikin nedibir, Jê re got: Ez xulam wele min libek xwar. Nayîf dirabe qantirekî ji dêvla wê liba piraxa ji yê xulam distîne.

Li derdora gundê Tebkê çi heye.

Li hêla bakur, gundê Mêrga Mîra ye, tê gotin ku ev gund kevn e ji ber nêzîkbûna wî ji bajarê Kurik re, ew bajar bi xwe îro nemaye lê dema ku mirov diçe ciyê bajêr mirov dizane ku ev der berê bajar bû, û hin dibêjin ku ev bajar beriya sed û pêncî salî û bi şûn de avabû, ew dever hemî li ser wî bajarî bûn, lê pirsek tê bîra mirov, çima û çawa ew bajar xirabûye sedema wêrankirina wî çi bû û xelkê wî bi ku de çûne, gelo ew bajarê Kurdan bû, Kurdan ava kir û biyaniya xirab kir, yan biyaniya ava kir û kurdan xirab kir!? Bi rastî min ji gelek kalemêran pirsiye lê mixabin kes tiştekî li ser vî bajarî nizane, wekî dî du dar di ser şûn warê bajêre hene yek jê re dibêjin dara keçikê û yadî jê re dibêjin dara kurik, dibe ku çîroka keçika kezî û kurikê Rewal girêdayî be bi xirabkirina bajêr ve.?

li hêla rojhilat, gundê Besta Sûse heye ew hema bêje du newal di navbera wan de ne ew jî gundê koçera ye û herdû gund pir nêzîkî hev in.

li hêla rojava gundê, Girê Reşe, ev gund ne koçer in lê dibêjin yê ku Girê Reş ava kiriye ne ev xelkê niha têne bûn, dibêjin xelkê Girziyaret û bi taybet mala Sebrî lê Sebriyê çi ez wê nizanim, lê wek ku ji min re hatî gotin koçer û hin Erebê Şemera bi hev re êvarekê bi ser gund de girtine û xelkê gund tirsandine da ku ji wir bar bikin û bi rastî jî di ber wê êrîşê re ji wir bar kirine.

li hêla başûr, gundê Sê Gira ye, heye lê ew hinekî dûr e ji gundê Tebkê, lê ew jî koçer in. lê li başûrî gund berîke vala ye, lê li rojhilat û rojava û bakur hemî hêrik û newal in, û bi sedan bîrê Betrolê li wan qelaça di hinavê axa Kurdistanê de hatine kolan, û Betrol tê derxistin..!?

Di navbera gundê Tebkê û gundê Besta Sûs de newalek heye, dema ku melayê Besta Sûs bang dide dengê wî dighe Tebkê û bi vî rengî jî gundê Girê Reş ew jî wisa nêzîkî Tebkê ye li hêla bakur gundê Mêrga Mîra jî nêzîkî Tebkê ye.

sal 2006